Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar :1080 | 9-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

Navnîşan
www.ronahi.net/ku/
nameronahi@gmail.com
423165

# Ji şehîd Nûrî Yekta helbesta ‘Ez Helmet im’

**Gerîla TV’yê helbesta ku Endamê Fermandariya Eyaleta Metînayê Nûrî Yekta yê ku di Hezîrana 2022’an de şehîd bûbû ji bo bîranîna Endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Diyar Xerîb (Helmet) nivîsandibû, weşand.**

Di rêzikên dawîn ên helbestê de tê gotin ‘Bila wezaret û kursî yên we bin, welat û fedakarî bila ya min be, ez Helmet im.”

Endamê Komîteya Navendî ya PKK’ê û Endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Diyar Xerîb (Helmet) di




Gerîlayê HPG’ê Nûrî Yekta beriya ku şehîd bikeve ji bo Endamê Komîteya Navendî ya PKK’ê û Endamê Konseya Serokatiya Giştî ya KCK’ê Diyar Xerîb helbestek nivîsandibû.

Gerîla TV’yê klîba derbarê vê helbestê weşand. Helbest bi Soranî ye û qala têkoşîn, helwest û baweriya şehîd Helmet dike.

26’ê Hezîrana 2019’an de li Qendîlê di êrîşa dewleta Tirk a dagirker de şehîd bûbû.

Endamê Fermandariya Eyaleta Metînayê û fermandarê berxwedana eniya Girê Hekarî Nûrî Yekta (Cevat Etarek) jî di 3’ê Hezîrana 2002’an de di êrîşa bi bombeya nukleer a dewleta Tirk de li Metînayê şehîd bûbû.

# Bandora neyînî ya guhertina avhewayê li zindiyên deryayê

**Tê gotin, ji ber germbûna derya û okyanûsan, cînsiyeta masiyan tê guhertin û bi giranî dibin nêr. Li gorî lêkolînekê ku zanyaran weşandin, dema ku mirov dest an jî lingê xwe bixin nava ava derya ya jî okyanûsan ev yek bandoreke neyînî li mirovan nake.**

Lê belê li kûrahiya okyanûsan, yanî li qadên jiyanê yên masiyan dema ku av bi pileyekê yan jî du pileyan germ dibe, metirsiyeke mezin li ser jiyana masiyan çêdibe.

ke zanistî ya bi navê “Trends in Ecology and Evolution” hate weşandin. Li gorî lêkolînê, masî ji ber guhertina avhewayê dikevin stresê û stres jî dibe sedem ku zayenda wan nêr bibe. Tê destnîşankirin, stres sedema wê yekê ye ku zayenda gelek cûreyên zindiyan bibe nêr, ku heman encam di nava mirovan de jî derdikeve holê. Psîkologê hawirdorê Benjamin Geffroy bal kişand ser bandora stresê û diyar kir, hin cûreyên masiyan 70 sal in tên şopandin û bi germbûna avhewayê re nêrbûna zayenda ma-



Zanyaran diyar kirin, ji ber qirêjbûna deryayê, her wiha ji ber masîgiriya zêde jiyan li masiyan herimiye û ragihandin, ji ber guhertina avhewayê jî gelek cûreyên masiyan li ber tinebûnê ne.

Encamên lêkolîneke zanistî li kovare-

siyan zêde bûye. Geffroy anî ziman, ev rewş jî dibe ku rê li ber tinebûna gelek cûreyên zindiyan veke.

Destnîşan dike ku ji bo cûreyên hin zindiyan bidomin divê stres ji holê bê rakirin.

# Entîkefiroşek

**Mihemed Ehmed li Şêxmeqsûdê di dikana xwe de alavên kevn nû dike û gelek entîkeyan berhev dike. Bi vî karî hem mîrasa pêşiyên xwe diparêze, hem jî debara xwe dike.**

Apê Mihemed Ehmed ku hewesa wî ya komkirina tiştên kevn heye, ji bo parastina mîrasa pêşiyên xwe tiştên kevnare nû dike. Ew tiştên ku pir kêm li mal û sûkan peyda dibin, li dikana xwe ya biçûk a li rojavayê taxa Şêxmeqsûd a Helebê difiroşe.

Apê Mihemed ji gundê Çolaqa yê navçeya Bilbilê ya Efrînê ye. Ev 43 sal e bi karê nûkirin û biriqandina tiştên kevn mijûl dibe.

Apê Mihemed ji bavê xwe fêrî vê pîşeyê bûye û êdî bûye pisporê wê. Beriya Efrîn were dagirkirin, dikaneke wî li Efrînê hebû û li wir karê xwe dikir. Piştî ku Efrîn hat dagirkirin û koçberî Helebê bû, careke din dikana xwe li Helebê vekir.

Apê Mihemed zava û kurê xwe bi xwe re dibe dikanê û vî karî fêrî wan jî dike da ku wekî mîraseke malbata wan bimîne û bi demê



re winda nebe.

## Nûkirina alavên kevn

Apê Mihemed li sûkan digere, alavên kevn dikire, heke xirabe bin temîr dike, dibiriqîne û difiroşe. Apê Mihemed der barê pîşeya xwe de dibêje: “Hin kesên ku wek min tiştên kevn bala wan dikişînin, dixwazin alavên xwe yên kevn ên xirabe sererast bikin, ez ji wan re sererast dikim. Heke min tiştekî kevn li sûkan dît, ez dikirim û ji bo firotinê li dikana xwe bi cih dikim.”

## Bandora dorpêçê

Dorpêça ku hikumeta Şamê daniye ser taxên Şêxmeqsûd û Eşrefiyê, bandor li pîşeya Apê Mihemed jî kiriye û buhayê alavên ku ji sûkê dikire, du qat zêde bûye.

Her wiha ji bo xebitandina hin alavên sererastkirinê kehrebe gelekî pêwîst dike. Lê belê Apê Mihemed tenê dikare heqê 6 ampêr kehrebeyê bide. Ew bi saetan li benda kehrebeya hikumetê dimîne da ku karê xwe bike. Ev yek karê wî dereng dixe.

Apê Mihemed dijbêje:“Bi dorpêçê re hemû derî li me hatin girtin. Bihabûnê bandoreke xirab li karê me kir.”

Apê Mihemed banga parastina alavên kevn dike û dibêje: “Divê em zû dev ji tiştên xwe yên kevn bernedin. Li şûna em diavêjin, divê em wan sererast bikin.”

Sudoku: Bersiv 89

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 4 | 7 | 3 | 6 | 2 | 1 | 5 | 8 | 9 |
| 2 | 9 | 1 | 8 | 4 | 5 | 6 | 7 | 3 |
| 5 | 6 | 8 | 7 | 3 | 9 | 4 | 2 | 1 |
| 3 | 4 | 5 | 9 | 1 | 2 | 7 | 6 | 8 |
| 7 | 8 | 9 | 4 | 6 | 3 | 2 | 1 | 5 |
| 6 | 1 | 2 | 5 | 7 | 8 | 3 | 9 | 4 |
| 9 | 2 | 4 | 3 | 8 | 7 | 1 | 5 | 6 |
| 8 | 3 | 7 | 1 | 5 | 6 | 9 | 4 | 2 |
| 1 | 5 | 6 | 2 | 9 | 4 | 8 | 3 | 7 |


Sudoku:Pirs 90

| | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| | | | | | 3 | | | |
| | 1 | 3 | 6 | | | 9 | | |
| 7 | | 5 | | 8 | | | 3 | 2 |
| 2 | 7 | | | 4 | | | | 3 |
| | | | 8 | 3 | 6 | | | |
| 6 | | | | 1 | | | 5 | 9 |
| 3 | 9 | | | 5 | | 1 | | 4 |
| | | 1 | | | 2 | 7 | 9 | |
| | | | 1 | | | | | |

## Quncika Têgînan

| | |
|---|---|
| **Ardû** | **Tiştên ku agir bi wan pê dikeve; weke êzing, dar û tiştên wisa.** |
| **Deklarasyon (Fransî)** | Ragihandin, daxuyanî, danezan: Bi deklarasyonekê serxwebûna xwe ragihand. |
| **Defakto (Latînî)** | Tişta ku dibe û pêk tê lê ne fermî: Başûrê Kurdistanê defakto dewlet e. |
| **Heman** | 1. Tiştên, yan kesên weke hev, eynî: Em heman tiştî dixwin. 2. Du karên di yek zemanî de: A, di heman demê de du karan bi hev re dike. |
| **Meteor (Fransî)** | Kevirên ji ezmanan dikevin dinyayê. |
| **Nostaljî (Fransî)** | Hestê bîrîkirina tiştên bedew yên berê. |
| **Pêşeng** | Rêber, serok, mezin, rêzan: A, pêşengekî pir baş e. |
| **Pêşengî** | Rêberî, serokî, mezinayî, rêzanî: A, pêşengiyeke pir baş dike. |
| **Pêşniyaz** | Pêşniyar, pêşkêşkirin, teklîf. Ji bo ku bê pejirandin, pêşkêşkêşkirina daxwaziyekê: Al, pêşniyaz kir ku riya kolanê bê çêkirin. |
| **Reaksiyon (Fransî)** | Bertek, nerazîbûn, li hemberî tiştekî diyarkirina helwestê: Li hemberî axaftina wî reaksiyon nîşan da. |

## ‘Hêzên navneteweyî hevkarê sûcê tecrîdê ne’



Endamê Saziya Malbatê Şehîdan a bajarê Qamişlo Ebdulqadir Îbrahîm diyar kir ku tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocala sûcekî dijmirovî ye, tevahiya nirxên mirovahiyê binpê dike û got, hêzên navneteweyî bi bêdengiya xwe hevkarên sûcê tecrîdê ne.R-4

## Çîroka mezinahiya gelan



Asya Tirk, Thomas Elman, Diyako Kurd bûn. Ya ku hersê gihand hev, cewhera mirovahiyê bû. Çîroka wan çîroka mezinahiya gelan e.R-6



## Felsefe û Jin Jiyan Azadî

Ji Raperîna ku di kesayeta Jîna Emînî de li Rojhilatê Kurdistanê bi pêş ketiye ta îro dirûşma “JIN JIYAN AZADÎ” bûye pênaseya hemû jinên Rojhilata Navîn û cîhanê. Êdî bûye jêneger a jiyana wan. Êdî hemû xebat û çalakiyên xwe li ser vê bingehê ava dikin.R-2

**Hevîneke germ li benda me ye**

Idrîs Henan R-5


Ronahî
Şopdara Rastiyê ye
Rojnameya siyasî, civakî û çandî | Jimar : 1080 | 9-Tîrmeh- 2023 | www.ronahi.net/ku/

# YEKÎTIYA NETEWEYÎ MISOGERIYA TÊKBIRINA LOZANÊ YE

Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS), di 6 – 7’ê Tîrmehê de komxebateke navneteweyî bi navê ‘Lozan: Rastkirin û çareserkirina pirsgirêkên aramî û ewlehîya herêmî’ li dar xist. Di komxebatê de sedsaliya Peymana Lozanê hat destgirtin. 200 kes ji partiyên siyasî, akademîsyen, tevgerên jinan, saziyên civakî û rewşenbîrên ji her çar perçeyên Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Rûsya, welatan Ereban û kesayetên navneteweyî beşdarî komxebatê bûn.R-3




## Şoreşa Rojava şoreşa mirovahiyê ye



Endamê Konseya Rêveber a KCK’ê Sabrî Ok girêdayî şoreşa 19’ê Tîrmehê û salvegera Şoreşa Rojaava nirxandin kir û got. Şoreşa Rojava di dîroka mirovahiyê de cihekî gelekî girîng girt. Dibe ku ji aliyê cih û erdnîgariyê ve biçûk be, lê Şoreşa Rojava xwedî wateyeke mezin e. Tê gotin ku her şoreş encama hemû şoreşan e.R-3

## Rûpelek ji dîrokê



Dîroka Kurdan a şoreş û azadîxwaziyê bi qasî rengîniya diyalektîk û erdingariya wan dewlemende, lê kelemên xiyanetê jî tim û tim li kêleka gulên evîndarên dozê şîn bûne. Bi îmzakirina peymana Lozanê re ku hevçax bû bi hilweşîna Imperatoriya Osmanî re dîsa rûçikê xiyanetê yê gemar hate dîtin. Ew cara çendê bû ez nizanim lê vê carê aşê wê xiyanet xwîneke mezin bi xwe re da herikandin. R-5

# Felsefe û Jin Jiyan Azadî

**Xecê Şen**



Ji Raperîna ku di kesayeta Jîna Mehsa Emînî de li Rojhilatê Kurdistanê bi pêş ketiye ta îro dirûşma “JIN JIYAN AZADÎ” bûye pênaseya hemû jinên Rojhilata Navîn û cîhanê. Êdî bûye jêneger a jiyana wan. Êdî hemû xebat û çalakiyên xwe li ser vê bingehê ava dikin. “JIN JIYAN AZADÎ” çawa ku bûye malê hemû jinên Cîhanê, ew qasî di nava rewşenbîran de jî bûye mijara arîşe û nîqaşan. Ev demeke dirêje ku di nava rewşenbîr û ronakbîrên Kurdan û taybetî jî di nava rewşenbîrên mêr de li ser vê pênaseya dirûşma “JIN JIYAN AZADÎ” nîqaşên ecêb tên kirin. Gelek ji wan dibêjin; “JIN JIYAN AZADÎ” tenê dirûşmeke û tu pêywendiya wê bi felsefeyê re tune û ev kêmasiyeke mezin e ku dirûşmeke weku felsefeyê tê pênasekirin û hinekê ji wan jî dibêjin; “JIN JIYAN AZADÎ” tenê dirûşmeke ya tevgerên siyasî ne ku tenê di çalakiyên jinan de tê berzkirin. Anku “JIN JIYAN AZADÎ” weku felsefe hatî pênasekirin şaş dibînin û dibêjin felsefe xwedî pîvan û pênaseyên wê yên xwerû hene û ji bo ku ev weke felsefe bê pejirandin divê xwedî pîvan û prensîbên pirs û xwepirsînê be.

Bêguman felsefe xwedî pîvan û prensîbên pirs, bersiv, lêgerîna JIYANeke ya civaknasî û rewşitiyê (etîk-estetîk) ye. Jixwe tu kes nikare vê yekê înkar jî bike. Li gorî baweriya min eger ku di jiyana mirovekê/î de yan jî di jiyana mirovan de felsefe tune be, mirov nikare behsa heqîqeta gerdûnê û heqîqeta hebûna jiyana mirovan jî bike û nikare felsefe bike mijara nîqaşan jî. Pirsên weku hebûn û tunebûn, çi û çawa bi yekser bi felsefeyê ve tê pênaskirin. Ev rastî û heqîqeta felsefeyê ye. Jixwe mebesta nivîsa min jî ne bi yekser felsefe û pîvanên wê ye. Mebesta nivîsê pêywendiya felsefê û “JIN JIYAN AZADÎ” çi qas bi hev re heye û çawa pêk hatiye.

Belê, bêguman her dirûşm nabe felsefe yan jî nabe parçeyeke ya felsefe û ji jiyana microvan re jî nabe mal. Ev pênaseyeke di cihê de ye, lê ne ji bo hemû dirûşman e. Anku ev pênase ji bo hemû dirûşmeya nederbasdar e. Di jiyana mirovan, damezrandina tevgeran û çalakiyên wan de hinek fikir dibin dirûşim û ew dirûşm dibin pênaseya nasnameya wan a jiyana azad û dibin parçeyeke jêneger a jiyana wan. Ev jî heqîqeta “Tîp û Têgîna” felsefeya zimanê dirûşmê ya tevgerê dide xuyankirin. Her wiha ji heqîqeta Tîp û Têgîna felsefeya zimanê Kurdî jî ya herî bingehîn dirûşma “JIN JIYAN AZADÎ” ye ku îro li hemû cîhanê weku felsefeya JIYANê tê pênasekirin. Bêguman ev pênase wisa ji nişka ve û bi hêsanî derneket holê. Ev di encama dayîna berdêlên mezin a têkoşîna azadiya jinên Kurd de derket holê.

Dirûşma “JIN JIYAN AZADÎ” yekem car di parêznameya Parastina Gelekî ya A. Ocalan derket pêşberî me. Ocalan di parêznameyê de ziman-çanda Kurdî û taybetmendiya zimanê Kurdî wiha gotiyê;
“Divê Kurdistan ne bi awayeke fîzîkî bi awayeke ziman û çandî bê fikrandin. Bi taxmînî 6000 sal berê eşîran avasaziyeke wisa bi awayeke şênber bi dest xistine. Jixwe peyvên ku eşîrên kurdên çiyayî bi kar tîne jî, şopên wan di zimanê Hûrriyan de jî tên xuyakirin. Heta ku di zimanên koma Hînd-Ewropan de jî hatiye bikaranîn. Pêyvên kevnare yên weku murd=ölüm, mirin, jin= kadın, JIYAN=yaşam, raro=güneş, stêrk=yildiz vê rastiyê dane xuyakirin”. (rp=232)

Her weku me li jor jî aniye ziman pênaseya “JIN JIYAN AZADÎ” (KADIN YAŞAM ÖZGÜRLÜK) yekem car bi Parêznameya Gelekî ya Ocalan a ku di sala 2004’an de derxistibû de kete jiyana jinên Kurd. Ji wê salê şûn de jinên li Bakûrê Kurdistanê yên ku ji bo azadiya jinan, azadiya Kurdistanî û azadiya hemû mirovahiyê têdikoşin risteke mezin girtin ser milên xwe. Wan hem ji bo xwenasînê, hem ji bo pêşxistin û pêşdebirina “JIN JIYAN AZADÎ” û hem jî ji bo guhertin û veguhertina civakê bi ruhê seferberiyê têkoşiyan. Jinên Bakûr hem ji hêla fikrî û ramanî ve xebatên weku akademî bi pêşxistin, hem bi vê re bûne avasazî û hem jî xeta wê ya çalakiyê bi pêş xistin. Di dîroka Kurdan de cara yekemîn pêngava “Em Ne Namûsa Tu Kesî Ne Namûsa Me Azadiya Me Ye” bi pênaseya “JIN JIYAN AZADÎ” hat pêşxistin. Êdî ev heqîqeta “JIN JIYAN AZADÎ” bi Şoreşa Jinan a Rojava, Şoreşa Jinan a Şengalê û Raperîna ku di kesayeta jina Kurd Jîna Mehsa Emînî de ku li Rojhilatê Kurdistanê pêk hat de şêber bû. Êdî îro jî bûye pênaseya felsefeya jiyana hemû jinên cîhanê û ya hemû mirovahiyê.
Her weku Ocalan jî di parêznameya xwe de dewlemendiya ziman û çanda Kurdî aniye ziman, ev ne tenê di zimanê koma Hînd- Ewropayê de tê xuyakirin, ev heqîqeta felsefeya zimanê herî kevnare yê Kurdî ye û di heman demê de di gelek zimanên weku Erebî, Farisî û Tirkî de jî pir tê xuyakirin. Ji ber ku zimanê Kurdî, zimaneke xwedî felsefî ye û li kodên felsefeya ziman avasaz bûye. Ji ber vê yekê ye bandoreke xwe ya mezin ser li ser hemû ziman kiriye. Li gor lêkolînên ku di van salên dawîn de li ser zimanan hatiye kirin, di nav hemû zimanên cîhanê de, tenê di zimanê Kurdî de felsefe tê xuyakirin. Ji ber ku her kiteyeke zimanê Kurdî li ser esasê bingeha kodên felsefeyê hatiye avasaz kirin. Em ê jî em ê jî hewl bidin ku ji hêlên wê yên koknasî û felsefeyî ve tîp, têgîn û kodên “JIN JIYAN AZADÎ” veçirînin û şîkar û şîravayên xwe bikin.

**Pêywendiya felsefeyê û ya Jin Jiyan Azadî bi hev re çi ne û çawa bi hev re pêk hatine?**

Belê, em ê di vê mijarê de şîkar û şîravayên xwe li ser felsefeya “JIN JIYAN AZADÎ” kûrtir û hûrtir bikin. Di rastiya dîroka jinên Kurd û ya axa pîroz a Kurdistanê de gelek heqîqet an hatiye veşartin an jî hatine windakirin. Ji van heqîqetên ku hatine veşartin yan jî hatine windakirin jî dîroka serdema felsefeya Mêhrî-Mîtrayî ye ku ev serdem di heman demê de jî weku serdema felsefeya Kurdan û felsefeya zimanê Kurdî ya yekem tê pênasekirin. Dema ku mirov li ser dîroka felsefeya Mêhrî-Mîtrayî lêkolînê dike û di kûrahî, dûrahî û lêhûriya wê de diçe mirov vê yekê hêj baştir jî dibîne. Li gorî lêkolîn, erdkolînên ku di salên dawî li Bakûr, Başûr û Rojhilatê Kurdistanê hatine kirin de encamên hatine bidestxistin vê yekê piştrast dikin û felsefeya serdema Mêhrî-Mîtrayî şênber dikin. Dîroka felsefe û fikra Mêhrî-Mîtrayî zêdetirî 15 hezar sal beriya zayînê li ser çiyastanê “Zaggroz”ê zayînde bûye. Jixwe ji wê serdemê re jî serdema ZAG-ZİK-ZAD-ZADÎ-ZADÊ-ROZ- tê gotin. Ev serdem di heman demê de weku serdema yekem car a dîroka zimanê Kurdî jî tê pejirandin. Ji ber ku ev ziman ji hêla qewmên çiyastanî ve weku hest, tîp û kodên yek kîteyî hatine çêkirin.

Li gorî teşedayîn û afirandina zimanê Mêhrî-Mîtrayî tîpên yekem car ên hevpar û afirîner li ser baweriya felsefeya herçar axşîngên bingehîn ên gerdûnê “=ez=as, ax, av, ar”ê- A û Z hatiye afirandin. Ev herdu tîp li ser esasê bingeha van herçar axşan afirîner bûne. Hêjayî gotinê ye ku herçar axşên gerdûnê jî bi van her du tîpan tê pênasekirin. Anku gerdûn li ser van her du tîpên du cot ên “A û Z” av-A-saz-Z bûye. Êdî li gorî demzemanan, li gorî xêzkirina bûyeran ziman cih diguherînin û kodên weku ezman, asîman, aw=av, avzêm, az, ziwan=ziban= ziman=ezman, zînde= zehde= zad=za=zê, az diafirînin. Ji ber ku ev her du tîp afirîneriyên JIYANê ne. Tîpa “Z” bi demê re dirofê “J” digire. Di zaravayên herî kevnareyên Kurdî Pehlewî, Hewremanî, Kelhûrî, Soranî û kirdîkî (zazakî) de her tîpa “Z” heye û tenê tîpa “Z”ê bi kar tînin. Di van salên dawîn de ji ber bandora Kurmancî, êdî di Soranî û Hewremanî de tîpa “J”jî tê bikaranîn. Her wiha ji van herdu tîpan gelek kodên zanistî çêbûne. Jixwe ji ber van kodên zanistiye ku felsefeya zimanê Kurdî hatiye pênasekirin. Her wiha tîpa herî sereke ku di hemû kodan de ristê dilîze û afirîneriya JIYANê pêk tîne jî tîpa mê anku “Z” ye. Lewma ji tîpa “Z” kodên weku zî, zîn, zîndî=zînde, zen, zendegî, zîndewer, ziyar û ziyan pêk hatine. Jixwe li gor lêkolînên ku me li ser kodên felsefeya ziman kiriye hemû jî ji heman kokê ne. anku li ser koka “Z” pêk hatine. Lê piştre jî tîpa “Z” bi demê re di Kurmancî de veguheriyê tîpa “J” û êdî dî kodên weku jî, jîn, JIYAN, jiyar, jîndar, jînwer û ro-jîn dirof digire. Ji ber heqîqeta van kodên zimanê Kurdî ye ku ev 4-5 sal êdî felsefeya zimanê Kurdî tê nîqaşkirin. Bêguman têgînên “JIN, JIYAN AZADÎ” jî bingeha xwe ji van rastiya kodên felsefeya zimanê herî kevnareyê Kurdî Mêhrî-Mîtrayî digire. Ji ber vê heqîqeta dîrokî ye ku îro dirûşma “JIN JIYAN AZADÎ” weku felsefe tê pênasekirin û ev felsefe bûye felsefeyeke gerdûnî ya hemû jinên cîhanê û ya hemû mirovahiyê.
Belê, Dîsa Jin, Dîsa Jiyan û Dîsa Azadî!
JIN JIYAN AZADÎ!

# ‘Bi hêviya vegera Efrînê em dijîn’

**Zana Roj/ Şehba**

**Gelê Efrînê yê afrîner, piştî dagirkirina Efrînê û koçberbûna bi darê zorê. Lê dest ji avakirina jiyaneke nû û heskirina çandiniyê berneadan. Tevî şert û mercên jiyanê yên zehmet jî, jina Efrînî ya bi navê Huriye Mihemed ji ber girêdana wê ya bi çandiniyê re, şitilgeheke ava kir û têde gelek cureyên dar û gulan çand.**

Divê mirov rastiya girêdana gelê Efrînê bi çandinî û xwedîkirina dar û gulistanan re ji bîr neke. Piraniya gelê herêma Efrîn bi çandiniyê re mijûl dibû û debara jiyana xwe dikirin, di asta yekemîn de jî, darên zeytûnan xwedî dikirin. Piştî dagirkirina Efrînê ji aliyê dewleta Tirk a dagirker û çeteyên wê jî, her çiqas cih û cografî jî hat guhertin, gelê



Huriye Mihemed

Efrînê tu carî dest ji hezkirina xweza û çandiniyê berneda. Yek ji mînakên wê jî, jina bi navê Horiyê mihemed e. Yadê Huriye ku ji gundê Kefir Sefrê yê girêdayî navçeya Cindirêsê ye, piştî derbasbûna gelê Efrînê ji herêma Şehbayê re, li navçeya Ehdasê bi cih bû, bi temenê xwe yê mezin di derûniya koçberiyê de û zehmetiyên jiyan de, ew jî weke her Efrîniyekî nikarî ji xweza û çandiniyê dûr bikeve. Di şert û mercên zehmet yên jiyanê de, şitilgehek ava kir, têde kar û xebatên çandiniya dar û gulan dike
.

**Heskirina kar ji bo wê pîroz e**

Yadê Huriye derbarê avakirina şitilgehê de wiha anî ziman anî ziman: “Dema em li Efrînê bûn şitilgeha me hebû, min û malbata xwe tê de kar dikir. Di şitilgehê de tavahiya cureyên dar û gulan hebûn. Me bi dilşadî xizmet dikir û dibû jêdara debara jiyana me. Min bi temenê xwe yê mezin û ruxmî nexweşiyên min jî, ji ber hezkirina min ji vî karî re, ji serê sibê heyanî êvarê di nava şitilgehê de bê westîbûn, min kar dikir, ev xebat ji bo min pîroz e. Lê belê ji ber hovîtiya dijmin em mecbûr man her tiştî bi êşeke mezin li dû xwe bihêlin.”

**Xeyalên me temam nebûn**

Yadê Huriye diyar kir ku dagirkeriyê destkeftî û xeyalên wan ji wan sitand û wiha got: “Her maleke Efrînî bi aramî û li gorî hêza xwe kar dikirin û jiyana xwe didomandin. Xeyalên me yên mezin ji bo pêşeroj û zarokên me hebûn. Lê belê di rojekî de em ketin xewnekî ku şiyar bûna wê tune ye. Dijmin bi dagirkirina Efrînê re xeyal û pêşerojên ku me bi hêza xwe mezin dikirin ji me stand, lê kêliyekî jî di oxira Efrînê de me dev ji berxwedaniyê berneda.”

**Li ser hêviya vegerê dar û gulan mezin dikim**

Koçberî li pîşiya helwesta yadê Huriye nebû asteng, wê careke din bi hêviya vegerê dest bi karê xwe kir, yadê Huriyê wia li axaftina xwe zêde kir: “Li Şehbayê me xwe komî ser hev kir û me jiyana xwe domand, zehmetî hebûn û hene jî hene, lê belê min dêt ku nabe ez her dem wiha bimînim, ji lewra min bi malbata xwe re parve kir ku em careke din şitilgeheke li gorî derfetên xwe vekin û me dest pê kir. Bi kêm derfetan me karî ev şitilgeh ava bikin û bigihînin vê astê, a niha jî bi hezara cureyên dar û gulan hene, ez van dar û gulan li ser hêviya vegerê didim mezinkirin. Neçarê û rawestîbûn ne çareseriye, bi hêviya vegera Efrînê em niha kar dikin û wê veger misoger be. Derveyî vê me tu xeyal nexistine mejiyê xwe.”



# Çalakiya HRRK`ê ya bi navê “Sala Melayê Cizîrî” brdewam e

Bi armanca danasîna dîrok, wêje û çanda kevnar a gelê kurd, felsefe û şîrovekirina helbestên bawermendê kurd ê kilasîk û pêşngê helbestvanên kurd, Melayê Cezîrî. HRRK`ê biryar da ku îsal bibe sala Melayê Cizîrî û çalakiyên wê bi gelemperî bi rengê rêzesemîneran werin dayîn. Ev yek ji bo pêşxistina asta ziman, wêjeyî, ronakbîrî li cem wêjvan, rewşenbîr û nivîskarên kurdan xwedî roleke pir mezin e.

**Hemza Sêvo/ Qamişlo**

Girêdayî vê yekê Ebdulbarî Ehmê diyar kir ku dema mirov felsefe, nêrîn û helbestên Melayê Cizîrî baş nas bike û bixwîne wê ji hemû aliyan ve pêşbikeve, herwiha Şepal Yûsif got, bi dayîna 15 semîneran HRRK`ê armancên xwe pêk anîn û hîna xebata çalakiyê berdewam e.
Hêjayî gotinê ye ku semînerên ku tên dayîn bi giştî li ser dahurandin û şîrovekirina helbestên nivîskarê kurd Melayê Cizîrê yê di sedsala 16`an de jiyaye radiweste. Herwiha rewşenbîr, nivîskar û kesên din jî di van semîneran de beşdar dibin. Di heman demê de jî nîqaşên berfireh li ser felsefeya Cizîrî ya di derbarê Yekîtiya Hebûnê, evîna mecazî û ya giyanî û gelek mijarên ji aliyê nivîskar Diyar Buhtî û beşdaran ve çêdibin.
HRRk`ê bi vîneke xurt di 21`ê sibata îsal de dest bi dayîna semînera xwe ya yekê kir, kesên beşdar jî ji tevaya herêma Cizîrê bi coşeke mezin tevlî vê semînerê bûn. Hêjayî gotinê ye ku heya niha 15 semîner hatin dayîn, 12 ji van semîneran ji aliyê nivîskar Diyar Buhtî ve hatin dayîn.
Di heman demê de mamoste Deham Ebdull Fetah jî di derbarê heman mijarê de semînerek da û herwiha mamoste Xalid Cemîl Muhemed bi riya tevna dijîtalî, ji başûrê Kurdistanê semînerk da. Ji bilî dayîna semînerên



Ebdulbarî Ehmê

bi rêbazê tekane, semînerke hevbeş ji aliyê Diyar Buhtî, Ehmed Huseyînî û Mellevan Resûl ve hat dayîn.
Herwiha ev rêzesmînerên, li navenda HRRK`ê ya li bajarê Qamişlo ji aliyê Nivîskarê kurd Diyar Buhtî ve tên dayîn. Her sêşem rewşenbîr û nivîskarên kurd li navndê li hev dicivin û ji demjimêr 19 heya demjimêr 20`an beşdarî van semîneran dibin û ev çalakî wê li ser asta sala 2023`yan bidomin.
Li gor ku endamên navenda HRRK`ê anîn ser ziman, derket holê ku hin rewşenbîr, nivîskar, wêjevanên kurd yên derveyî Rojavan dimînin nikarin beşdarî van semîneran bibin daxwziyeke wan jî heye ku ew jî tevlî van semîneran bibin û ji vê derfetê bêpar nemînin.
Têkildarî dayîna rêzesemînerên derbarê helbestên Melayê Cizîrî de, asta beşdarbûnê û sûdwergirtin û bandora hestên Cizîrî li giyanê rewşenbîr û nivîskaran, herwiha



Şepal Yûsif

endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, Ebdullbarî Ehmê û endama HRRK`ê Şepal Yûsif ji Rojnameya Ronahî re axivîn.

**‘Felsefe û evîna Cizîrî’**

Ehmê da zanîn ku Melayê Cizîrî xwedî nêrînên felsefî û evîna giyanî û gewdeyî yên cuda ne û wiha domand: “ Zana û bîrwer Melayê Cizîrî xwedî felsefeyeke pir kûr û berfireh e, herwiha gelek nêrînên wî yên felsefî di derbarê mijarên weke jiyana mirovan hebûna zindî û gerdûnê de hene. Li aliyekî din jî evîna wî ya ku di nava xwe de felsefyekê vedihewîne û dema ku mirov helbestên wî yên li ser evînê dixwîne rewanbêjî, mînandin û felsefeyeke pir berfireh têde dibîne. Cizîrî evîna xwedayî(giyanî) û mirov (cismanî) bi hev ve girêdide û evîndariya xweda bingehê evîna mirov, gerdûn û hemû tiştî ye. Ango mirov bi riya evîndariya xwedê, dibe evîndarê jin, dayîk, bav û hemû tiştên heyî. Bîrwerî û hakimiyeta Cizîrî di daraza helbestê û nêrînên felsefeya wî ya balkêş de hişt ku bibe feylesûf û helbestvanekî gewre û ji hemû helbestvanên kurd yên din cudatir bibe.”

**‘Naskirina Cizîrî ronakbîrî,wêje û zanînê pir dewlemend dike’**

Endamê Yekîtiya Rewşenbîrên Herêma Cizîrê, Ebdulbarî Ehmê diyar kir ku dema mirov felsefe, nêrîn û helbestên Melayê Cizîrî baş nas bike û bixwîne wê asta wî ya ronakbîrî, wêjeyî û zanînê dewlemend bibe û wiha got: “Berî dayîna semînerên têkildarî jiyan,felsefe,evîn û helbestên Melayê Cizîr, naskirineke me ya baş ji Cizîrî, helbest û nêrînên wî yên felsefî û evînê re tune bû. Lê bi saya van semîneran giyanê me bi helbest, evîn û felsefeya Cizîrî ve hate girêdan û bandoreke pir mezin li me rewşenbîr û nivîskaran kir. Seydayê Cizîrî xwedî felsefe, evîn, wêje û zanisteke berfireh e. Nepêkan e ku mirovê felsefe, nêrîn û zanista li cem wî nas bike, helbestên wî yên têr û tijî bixwîne, wêje, xeyal û pê bandor nebe. Em niha bi coşeke pir mezin beşdarî van semîneran dibin û nîqaşên hevpar di derbarê mijarên helbestan de dikin. Di rastiyê de ev semîner ji bo me kurdan jî derfeteke zêrîn e, ger ne bi riya van semîneran be jî, pêwîste gelê kurd miletperwer û pêşengê helbesta kurdî feylesûfê xwe nas bikin û helbestên wî bixwînin ji ber ku pir sûdmend in.”

**‘Bi riya semîneran têgihiştin û pêzanîna me pêşket’**

Şepal Yûsif di dawiyê de da xuyakirin ku armanca HRRK`ê danî pêşiya xwe pêk hat û hîn jî dana semîneran di Sala Czîrî de berdewam e: “Ev bû nêzî 6 mehan ku semîner ji aliyê mamoste Diyar Buhtî ve tên dayîn. Rewşenbîr û nivîskarên herema Cizîrê û heremên din bi coş û kelecaneke mezin tevlî van semîneran dibin. Armanc ji dayîna van semîneran ronîkirina rewşenbîran bi riya danasîna jiyan, felsefeya û şîrovekirina helbestên Melayê Cizîrîrî ye. Herwiha bi dayîna van semîneran encamên baş derketin holê. Yek ji van encaman jî berfirehkirina xeyalên kesên beşdar û bilindkirina asta hizrandina wêjeyî. Em bang li wan kesên hîna Cizîrî nas nekirine, helbestên wî nexwendine, evîn û felsefeya wî nasnekirine dikin ku tevlî semînerên ku li HRRK`ê tên dayîn bibin ji bona hîn baştir helbest û felsefeya Melayê Cezîrî nasbikin.”

# Her amûrek rengek yê hunerê ye

**Navenda nûçeyan**

**Mamostaya Gîtarê Helena Babat ku li Stêrka Zêrîn a Wargeha Penebaran ya Mexmûrê perwerde dide, diyar kir ku pêwîste her kes bi çand û hunera xwe re mezin bibe û bibe xwedî zanistek ya çandî û wiha got: “Pêwîste her zarokek di amûrek a mûzîkê de xwe perwerde bike, ji ber ku her amûrek rengek cudatir û têgihiştineke cudatir dide mirovan.”**

Li navenda Stêrka Zêrîn ji bo pêşxistin û perwerdekirina zarok û ciwanên Wargeha Penaberan a Şehîd Rustem Cûdî (Mexmûr) ya di aliyê amûrên mûzîkê yên weke Gîtar, Tembûr û Erebaneyê de piştî dibistan ketîn betlaneya havînê destpê kir. Têkildarî perwerdeya tê dayîn Mamosteya Gîtarê Helena Babat û xwendevanên di perwerdeyê de ji Rojnews’ê re axivîn.

**‘Bi kelecan tevdigerin’**

Helena Babat di destpêka axaftina xwe de destnîşan kir ku ew her sal di werza havînê de li Stêrka Zêrîn ji bo zarokên wargehê di valatiyê de nemînin û bikaribin wan di aliyê çandî de perwerde bikin, aktîvîteyên çandî didin destpêkirin û wiha got: “Wek tê zanîn dibistanên wargehê ev demeke ketiye betlaneya havînê. Me jî wek Stêrka Zêrîn xwest divê navberê de zarokên wargehê di aliyê amûrên hunerî û çandî de perwerde bikin. Em niha zarokan di aliyê Tembûr, Gîtar û Erbane de perwerde dikin. Gelek zarok û ciwanên me hene ku dixwazin xwe bi van amûran perwerde bikin, ji ber wê jî di waneya Gîtar û Tembûrê de me xwendevanên xwe kirin du kom. Lê di waneya Erbaneyê de tenê komek heye. Koma yên biçûk ji 8 salî heta 14 salîne, koma yên mezin jî ji 15 salî destpê dike. Xwendevan hemû li ser daxwaz û xwestekên xwe tên perwerdê. Ji ber vê yekê di kêliyên perwerdê de bi kelecan tevdigerin da ku zû hînî van amûran bibin. Dema em vê xwesteka wan dibînin, em gelek kêfxweş dibin û dixwazin hunera ku em dizanin di zûtirîn dem de fêrî wan bikin. Ji bo gelek bikaribe xwe li ser lingan bigre, pêwîste xwe di aliyê çandê de pêşbixe. Li ser vî bingehî ji bo em çanda xwe dewlementir bikin em zarokên wargehê di aliyê amûrên mûzîkê de perwerde dikin.”

**‘Her amûrek rengek û têgihiştinek cuda dide mirovan’**

Helena Babat di dawiya gotinên xwe de balkişand li ser girîngiya fêrbûna amûrên mûzîkê ku her amûrek ya mûzîkê rengek cuda dide jiyana mirovan û wiha pê de çû: “Pêwîste her zarokek di amûrek a mûzîkê de xwe perwerde bike. Ji ber ku her amûrek rengek cudatir û têgihiştineke cudatir dide mirovan. Ji derveyî perwerdeya em didin, li navenda Stêrka Zêrîn komên me yên govend û mûzîkê jî hene ku li vir perwerde dibînin. Her wiha ji bo berfirehkirina xebatên Stêrka Zêrîn, em gelek kesan perwerde dikin. Ez bang li tevahî ciwanên Kurd dikim ku di aliyê çand û hunera Kurdî de xwe pêşbixin.”



**‘Heskirina min ya ji bo Gîtarê di zarokatiyê de destpê kir’**

Xwendevana bi navê Roj Yildiztan ku xwe fêrî lêdana Gîtarê dike, qala perwerdeya xwe û heskirina xwe ya ji bo fêrbûna Gîtarê kir û wiha got: “Ev demeke me dest bi perwerdeya Gîtarê kiriye. Armanca me ewe ku em xwe di aliyê çand û hunera Kurdî de pêşbixin. Ez gelek kêfxweşim ku îro li vir di aliyê hunerê de xwe pêşdixim. Heskirina min ya ji bo Gîtarê di zarokatiyê de destpê kir. Ji bo ku ez vê heskirinê bikim malê civaka xwe, niha li navenda Stêrka Zêrîn li gel bi dehan ciwanên mîna xwe perwerde dibînim. Ev du havîne ez perwerda Gîtarê dibînim. Ez bang li ciwanên wargehê dikim ku li navenda Stêrka Zêrîn cihê xwe bigirin û xwe di aliyê hunerê de perwerde bikin. Temenê fêrbûnê tineye her kes dikare perwerde bibîne.”

**‘Tiştek xweşe ku ez lêdana Tembûrê bizanim’**

Her wiha xwendevanê bi navê Goyan Yeman ku ew jî xwe fêrî lêdana Tembûrê dike, da zanîn ku piştî dibistan ketine betlaneya dawiya salê, wan berê xwe da perwerdeya Tembûrê ya ku li navenda Stêrka Zêrîn hatî destpêkirin û wiha peyîvî: “Piştî dibistan ket betlaneya dawiya salê, ji bo ku ez xwe di aliyê lêxistina Tembûrê de pêşbixim beşdarî perwerdeya Stêrka Zêrîn bûm. Tiştek xweşe ku ez bizanibim li Tembûrê bidim. Mamostaya me gelek xweş perwerdê dide ez ji hevalên xwe yên perwerdê jî hes dikim. Ez dixwazim demê pêş li tembûrê bixim û stranan bibêjim.”

# Çîroka mezinahiya gelan

Asya Tirk, Thomas Elman, Diyako Kurd bûn. Ya ku hersê gihand hev, cewhera mirovahiyê bû. Çîroka wan çîroka mezinahiya gelan e.

Yek ji Ordûyê bi rê ket, yek ji Maînbûrgê, yek jî ji Sineyê. Asya, Thomas û Diyako li çiyayên Kurdistanê gihîştin hev.
Kadriye Tetîk bi nasnav Asya beriya ku dest bi rêwîtiya xwe ya li çiyayên Kurdistanê bike li Zanîngeha Samsûnê hewl dida bibe mamoste. Di demekê de ku mamostetî li Tirkiyeyê qet ne populer bû, xwendina li ser mamostetiyê weke rêyek ji bo bicihanîna armancên xwe yên azadiyê dîtibû. Asya baweriya xwe bi wê anî bû ku civakîbûna azad bi afirandina kesayetên azad dibe û difikirî ku rêya vê yekê jî perwerde ye. Hîn zarok bû, fikrê azad nas kir û haya xwe ji rola kesayet a di guherîna civakî de çêbû. Di demeke kurt de fêhm kir ku di nava sîstemê de bi hewldanên şexsî yan jî reforman encamek nikare bê bidestxistin. Asya dest bi lêgerîna têkoşîna radîkal kir û çareserî jî di nava fikrê sosyalîzmê de dît. Asya li bexçeyên findeqan ên Derya Reş ked nas kir, kedxwarî jî di şexsê kiryarên li dijî Kurdan de fêhm kir. Biçûkxistina wan Kurdan ku li qemyonan dihatin bicihkirin û ji bo karkirinê dibirin bexçeyên findeqan dît û di dilê xwe de li hemberî Kurdan xwe timî deyndar hîs dikir.
Lewma bi rengekî veşartî hevaltî bi Kurdan re kir. Asya di vê hevaltiyê de gihîşt rastiyeke girîng. Kurd berevajî propagandaya aqlê faşîst ê dewleta Tirk ê 50 salan, Kurd 'terorîst' nîne. Fêhm kiribû ku Mahîr Çayan, Îbrahîm Kaypakkaya û Denîz Gezmîş ne ji ber ku sosyalîst bûn, lê belê ji ber ku neteweperestiya şoven a Tirk deşîfre kiribûn hatibûn darvekirin.

Gava destpêkê ya Asya, bi kedê bûbû. Di oxira vî nirxê bilind, xwe ji têkoşînê neda alî. Bi xwe dîtibû ku gelê Kurd gelê herî kedkar e.

**Haya xwe ji neheqiyê hebû**

Haya xwe jê hebû ku neheqiyek tê kirin. Sûcdariya 'terorîst' a li dijî Kurdan dihate kirin, wê nikarîbûya pêşî li Asya bigirta. Piştî ku dewleta Tirk piştgirî da DAIŞ'ê ji bo li Rojava têkoşîna destanî ya Kurdan bişikîne, sebra Asya êdî fûriya. Ewqas êdî ji bo wê zêde bû, li dijî dewleta faşîst a Tirk ji bo şer bike, derbasî Rojava bû. Felsefeya azadiyê ya Kurdan ku ji vê derê li cîhanê belav kir, ji nêz ve nas kir û têgihişt ku terorîstê esasî dewlet bi xwe ye. Asya jiyaneke ji rêzê qebûl nekir û derbasî çiyê bû, bû endameke hêzên taybet. Asya têkoşîna xwe di nava şert û mercên awarte de meşand, tevlî çalakiya Xakurkê bû ku 18 dagirker lê hatin cezakirin.




**Ji bo Thomas rê diyar bû**

Thomas Johann Spîess bi nasnav Azad, şerma Nazî ya ku mîna kabûsekê bi ser gelê Elman ve ketibû, dît û di dilê xwe de tovên azadiyê çand. Netewe dewlet baş nirxand, dît ku hêrsa qezencê ya sermayeyê mirovan çawa bi hev dide qirkirin, dike mîna robotan. Pîşesaziya çekan a Elman, çavkaniyên xwezayî yên dihatin talankirin û civaka mîlîtarîst bû sedem ku Azad berê xwe bide utopya jiyana nû. Azad gelekî dixwend. Hewldana Elmanyayê ya ji bo serkêşiya ji bazara biçekbûnê, kir ku Azad bikeve nava fikrên kûr. Elmanya çekên ku hildiberan ji ku re difirot, çekên Elmanyayê li hemberî kê dihatin bikaranîn; ev hemû ew pirsên jiyanî bû ku rêya azadiyê ya Azad diyar kirin. Dema ku bihîst tanka Elman Leopard destpêkê li dijî Kurdan hate ceribandin, her wiha bi lêkolînan fêhm kir ku çekên kîmyewî yên li dijî gerîla têne bikaranîn ji aliyê şîrketên Elman ve ji bo Tirkiyeyê têne peydakirin, ji bo Azad rêya ku tê de bimeşe êdî diyar bûbû. Azad ji Rêbertî hîn bû ku li dijî mîlîtarîzma faşîst bi xwerêxistinî, bi hêza xwe şer dikare bê kirin. Amûra azadiyê ya Azad wê ne tundiya xwe dispêre dewletê bûya. Wî xweparastina civakê pejirand û cihê xwe di nava refên PKK'ê de girt. Dema ku tevlî nava refên PKK'ê bû pirsgirêka ziman hinekî kişandibe jî di demeke kurt de bi baldariyeke mezin hînî Kurdî bû.

**Azad ê li baskê êrîşê**

Azad ku di zilm û zordariya li ser gelê Kurd de para Ewropayê dît, ne weke Ewropiyekî, lê belê weke mirovekî cîhanî fikirî, hîs kir û di nava têkoşîna PKK'ê de serketineke mezin nîşan da. Di dema bêçalakîtiyê de jî li ser çiyayên Kurdistanê balafir kêm nedibûn. Azad weke şervanekî azadiyê tevî Asya û Diyako tevlî baskê êrîşê bû. Xwegihandina hev a Tirkekê, Elmanekî û Kurdekî gelekî bi wate bû. Ew ji bo afirandina wê wateyê bi rê ketibûn. Wê rojê li Xakurkê mil bi mil li ber xwe dan û gotin, 'Bijî biratiya gelan'.

**Diyako yê dayika xwe**

Dayika wî bi navê 'Diyako' bang lê dikir. Navê xwe yê li nava PKK'ê Koçer Medya bû. Diyako tê wateya dayika çiya. Çarenûsa Diyako jî di navê wî de veşartî bû. Di vê demê de ku dirûşma 'Jin, Jiyan, Azadî' deng vedide, Diyako li çiyê tevî şervanên azadiyê yên jin li çeperên azadiyê cih girtibû. Bi têkoşîneke ku hêjayî navê xwe bû, vediguherand dayika çiyayan. Dibe ku ji aliyê zayendiya biyolojîk ve pênasekirina vê yekê di cih de nîne, lê belê ji bo şehîdekî Kurdistanê wateya zayendiya biyolojîk nedima. Ji xwe eger ew leheng tevî nîşaneya biratiya gelan Asya û Thomas li çiyê ketibe çeperê, hingî ew pênase lê tê.

**Mediyekî hemdem bû**

Koçer Medya navê wî yê li nava PKK'ê bû. Dema ku ev nav li xwe kir, mîna ku ruhê şervanên qedîm ên Medê hîs kiribû. Medya konsensuseke gelan bû, li dijî împaratoriyên ku zext li gelan dikir şer kiribû û ew împaratorî têk biribû. Koçer jî weke Mediyekî hemdem derketibû ser dika dîrokê. Eger dîrok xwe dubare dike, hingî berxwedana Mediyên vê serdemê ku cîhan rakiriye ser piyan, tevî gelên Tirk, Ewropî û Kurdistanî mizgîniya serdemeke nû dide. Naxwe Asya Tirk a ji Ordûyê, Thomas ê Elman ji Maînbûrgê û Diyako yê Kurd ji Sineyê bi çi rengî dikare bê pênasekirin ku li hev kom bûn û di dilê me de hêviyek çandin? Ew mirovên leheng bûn ku ji bo armancên xwe şer kirin. Bi mîrateya azadiyê bûn hêvî ji siberojê re.

# Kesayet û hêza hundirîn

**Rêber Hebûn**

Pesindana raperî û şanan pêdiviyeke herî bê sînor e ji hebûn û jîndaran re, ji ber vê yekê dîtina me ji tirsê re mîna diyarkirina me ji rastiya êşên mirovan û serpêhatiyên wanî têkçûyî, yê ku rengê mirinê li ser wê hatibû danîn, û ji me re mirina gewdehî ne pirsgirêk e yê ku pala xwe dide li ser veguhêztina mirovan ji wêneyekî ta din, bi qasî ku mebesta me bi wê yekê ew bû taliya yên ku xelk dijîn û ew li pêş xewin û kabosên xwe ne û bûyerên yên bûn e sedemekê ji xemsarî û bêzariyê re, tiştê wan hîştibûn ku wekî miriyan bin, ji ber vê em takekesî dibînin mîna hêzeke moralî û giyanî pepûkî û xemsarî jêdibe, û ev naye pêkanîn ji derveyî dostaniya yê ku peywiran didin e malbatê, û ev dostaniya



wijdanî pêknaye ji bilî dema em bi evîn û zanînê bi heman demê bêne girêdan, û tengbûna rêyên gotûbêjê bi yê din ve bi demê re dihêle tirs binyad bibe û zora hiş û wijdanê bibe, yê em di jêderên êş û derdê dibînin destpêkek ji rizgarbûnê re, berhinde wateyekî ji vê vînê heye a armanca xwe pêkanîna aştîbûna xweser e, li gel wê xwebûn an awaz mîna vegera li henas e di balatir dîmênên xwe de, ji ber tiştekî ji mirina bi pergalê tirsê ve metirsîdartir nîne, ji ber ku pêdiviya xwe bi vînek e moralî bi zorbazî bîrawer heye, ji ber ew ne tenê mirin e, ew raman û berdewamiya jiyanê kuntirol dike û herwiha sirûştiya kiryaran û bersiva kirdeyê yê ku kiryarê mirov kuntirol dike bi giştî,dema mirin dibe bîrdozî an olekî, û desthilat li paş wê bi harbûn radiweste û bergiriya wê dike, neperoşkên xwe dixe di hiş û qirikên civakên xwe de bi rêya tirsê, û xortan artêş dike bi rêyên curbicur ta têkevin di zorengên bê dawî armanca wê mayîna ew desthilata pîroz mîna pîrozbûna ol û bîrdoziyê, û li rexê din ji tirsê ew pirsîn dimîne, çima dijîm, ev me dehf dide ku em valahiyê şîrove bikin a ku bedewbûnên jiyanê di hizran de çinî kiribû, û jiyanê bi tevahî dihêle bibe xapandin, berhinde ew zorenga pirreng mirovan dehf dide li meydanên bê jimar, bi hezkirina mirov bi têkçûna din ve girêdayî ye, û ya din di rexê xwe de destikek nahêlîne û bikartîne ji bo kûrkirina wê têkçûnê, ma ev yeka dibe nîşanekî li ser xwesteka mirov ji mirinê re bi rêya belavkirina xwe ji mirinê re, herwiha tiştê ku nakokî û bihevketin ancam dide gerentiyê ceng û pevçûnan, ti jîndar an kevir jê bi ewle nabe, û em çi girêdanê di navbera çanda rojhilatî yê ku bi werîsê bavanî ve qayîm e û di navbera çandeke takekesî guhê xwe nade li ser sirûştiya peywendiyê û pê re jiyan bike eger çawa be nabînin, berhinde em gelek û bi dirêjî li ser derdê ol û netewê diaxivîn û herwiha girêdana kor bi welî, mêrê ol û serwerên siyasî ve, di dema ku em vê yekê li Ewrûpayê nabînin û axaftin li ser mîna bîranîna dîroka kevin e, û ev rewanîbûn yê li pêş wê ew serxwebûn disekine,û ev tundirewî û tirs ji axaftina bi tiştê bi sernavê ol, zayend û siyaset bi hêsanî di civaka sivîlbûyî de belav e, û ev tişta me dibe ku em tirsê têbighin ji dûriyên wê ya felsefî a ponijînî yê ku di xwe de seyrana mirov di nav jiyan û nehêniyên wê û tiştên veşartî de kurtas dike, ji ber ku tirs amana bîr a fireh e û piralî ye di jiyana mirovahiyê û seyrana wê ya zehmet de bi rêya qenalên taliyê û girtina asoyên çareseriyê, an bi rêya afirandina hêviyekê û kirina wê mîna armancekê bi xwe.



# Şoreşa Rojava şoreşa mirovahiyê ye

Endamê Konseya Rêveber a KCK'ê Sabrî Ok girêdayî şoreşa 19'ê Tîrmehê û salvegera Şoreşa Rojaava nirxandin kir û got. Şoreşa Rojava di dîroka mirovahiyê de cihekî gelekî girîng girt. Dibe ku ji aliyê cih û erdnîgariyê ve biçûk be, lê Şoreşa Rojava xwedî wateyeke mezin e. Tê gotin ku her şoreş encama hemû şoreşan e.

**Navenda nûçeyan**

Şoreşa Rojava hemû şoreşên ku heta niha hatine jiyîn hem li xwe girt û hem jî derbas kir. Ji ber vê yekê ew pir girîng bû. Bi pêşengiya gelê Kurd, Ereb û Xiristiyan bi taybetî jinan li dijî DAIŞ û dewleta Tirk şoreşek kirin. Ger Şoreşa Rojava nebûya, belkî îro li erdnîgariya Rojhilata Navîn geşedanên cuda bibûna. DAIŞ, El Nûsra, wê çete hebin, kî dizane wê çawa êrîş û qetlîam li ser gelê Kurd were kirin, kî dizane dewleta Tirk wê li ku derê biçe? Şoreşa Rojava pêşî li vê girt. Bi vê wesîleyê ez careke din Şoreşa Rojava pîroz dikim. Bi deh hezaran şehîd hatin dayîn, em hemûyan bi rêzdarî bi bîr tînin. Em êrîşên dewleta Tirk ên li ser Rojava jî şermezar dikin.
Herî zêde dewleta Tirk li hemberî Şoreşa Rojava hêrs e û tehamulî şoreşê nake. Ev jî bi pirsgirêka Kurd ve girêdayî ye. Dewleta Tirk dixwaze li Rojhilata Navîn ti guhertin çênebe, bi taybetî jî tiştek ku Kurdan eleqedar dike, pêk neyê. Dibêje ger Kurd di guhertinê de hebin li ku bin ez ê êrîş bikim. Mixabin dinya vê rewşê qebûl dike. Mînak li Efrînê her roj bi dehan kes tên revandin, tacîz, talan, destavêtin, her tişt diqewime, lê cîhan bêdeng e. Heger li Rojhilata Navîn li şûna dewleta Tirk dewletek wiha bikira, wê Ewropa û Emerîka serî hildaba û hesab bipirsiya. Lê dewleta Tirk dike, endamê NATOyê ye. Ji wir hêza xwe distîne. Ew ne



tenê dagirkeriyê dike, di heman demê de wan cihan îlhak jî dike. Weke mînak hemû cihên ku li Bakur û Rojhilatê Sûriyê dagir kiribûn bi xwe ve girêdide. Hemû saziyên dewletê vekirin. Bi hezaran malbatên çeteyan li Serêkaniyê, Girê Spî bi cih kirine. Dixwazin demografiya Kurdan bi temamî biguherînin.

**Li Efrînê saziyan vedikin!**

Dewleta Tirk ji bo vê her rêbazê bi kar tîne, cîhan jî li hemberî vê bêdeng e. Tekane xema wan ev e, Divê penaber berê xwe nedin Ewropayê. Krîtera wan e. Jixwe dewleta Tirk ji bo vê ji Ewropayê pereyan distîne. Dewleta Tirk eşkere dibêje ku ew ê rê li ber statuya Kurdan bigire. Sedema têkoşînê ev e. Rojek jî tune ku êrîşî Rojava neyê kirin. Gelê me yê Ereb û Xiristiyan jî li dijî van êrîşan di nava berxwedaneke mezin de ne. Ew jî dizanin ku hinek dewlet çiqasî durû ne, berjewendiyên xwe di ser her tiştî re digirin. Ger ne wisa bûya, wê mudaxeleyî Efrînê bikirina, heke ne wisa bûya wê piştgirî nedana dewleta Tirk.
Ji ber vê yekê, zêde alternatîf tune. Ev alternatîf çi ne? Ya yekem ger ji destê wan were divê bi dewleta Sûriyeyê re gotûbêjê bikinn, hevdu fêm bikin û hevdu razî bikin ku çareseriyekê bibînin. Kurd dewletekê naxwazin an jî naxwazin dewleta heyî hilweşînin. Dixwaze mafê xwe bi dest bixe, ji bo rê û metoda vî tiştî jî siyaset û dîplomasiyê bikin. Heke ev pêk neyên, divê di her warî de di nava berxwedanê de bin, xwe baş bi rêxistin bikin. Bi taybetî divê civakê bi rêxistin bikin û li hemberî êrîşên dewleta Tirk amadekariya leşkerî bikin. Li Rojava serkeftinên mezin hatin bidestxistin. Ev bi rastî girîng e. Di ser ragihandina Rêveberiya Xweser re 11 sal derbas bûn. Sîstema ku 11 sal in tê avakirin tê parastin. Ger siyaseteke rast bê meşandin, civak baş bê rêxistinkirin, xebatên dîplomasiyê baş bên kirin wê pêşî li êrîşan bê girtin. Ya girîng ew e ku ruhê yekîtiya neteweyî di ser her tiştî re ye.
Mînak li Efrînê her roj tacîz, tecawiz, talan û qirkirin tê kirin, lê li aliyê din kesên li ser navê Kurd û Kurdistanê derdikevin û li wir saziyan vedikin, dagirkeriyê rewa dikin. Rê li ber dagirkeran vedikin. Divê gelê me wan bibîne.

**Darizandina çeteyên DAIŞ'ê**

Çend roj berê Rêveberiya Xweser ragihandibû ku ew ê çeteyên DAIŞ'ê yên ku girtine, bidarizînin. Li ser vê jî nîqaş tê kirin. Yên di komkujiyê re derbas bûn, yên xeteriya DAIŞ'ê jiyan kirin, yên ku zilma DAIŞ'ê dîtin, ev rewş bi kêfxweşî pêşwazî kirin. Çeteyên DAIŞ'ê celad bûn; serê jin, zarok û kalan jê dikirin. Helbet divê ev çeteyên hov bên darizandin. Lê bi qasî ku em dişopînin, dewletên navneteweyî li hemberî vê biryarê xemsar tevdigerin. Bi taybetî dewleta Tirk piştî vê biryarê gelekî hêrs bû. Eger DAIŞ bê darizandin û çete biaxivin wê gelek xerabiyên dewleta Tirk û yên bi DAIŞ'ê re hevkariyê dikin derkevin holê. Çawa di komkujî, talan, tacîz û tecawizê de cih girtin jî wê derkeve holê. Helbet dewleta Tirk vê naxwaze. Dibe ku dewletên din jî xwedî rewşek wiha bin. Eger ew dadgeh bên qebûlkirin wê statuya Bakur û Rojhilatê Sûriyê jî bê qebûlkirin. Hinek jê bi awayekî siyasî nêz dibin ji ber vê li hemberî vê biryarê xemsar tevdigerin. Lê Rêveberiya Xweser biryareke wisa stendiye. Bi dîtina min, ev biryareke hêja ye. Mafekî wisa yê gelê Kurd, Ereb û Xiristiyan û yên ku zilma DAIŞ'ê dibînin, heye.
Di zindanan de bi hezaran çeteyên DAIŞ'ê girtî ne. Ma ew ê heta kîngê wiha bin? Ger hêzeke din a DAIŞ'ê hebûya, li cihekî din ê cîhanê bûna, ne li Rojava; ez di wê baweriyê de me ku gelek hêzên navneteweyî, dewlet ji bo darizandina wan tiştekî bikin. Lê niha her kes tenê temaşe dike. Bila li Rojava bin, wan biparêzin, nizanim çi dikin, lê bila kes nehêle wan bikeve welatê xwe û wan nedarizîne. Îcar ev rewş wê heta kîngê bidome? Ev nêzîkatiyeke siyasî ye. Mafê Rêveberiya Xweser heye ku wan li gorî qanûnên xwe bidarizîne. Divê hiqûqa navneteweyî jî li ber çavan bigire. Berê jî daxuyanîyek wisa dabûn. Wan banga beşdariya gelek saziyên navneteweyî û parêzvanên hiqûqî kirin.
Ma ji vê adil û demokratîktir çi heye? Bi eşkere dixwazin endamên DAIŞ'ê bên darizandin. Divê ew jî bên darizandin. Ger nebe, rewşek xeternak heye. Du sal berê ji zindana Hesekê reviyan û bi sedan kes qetil kirin. Dîsa piştî rizgarkirina Kobanê şevekê êrîşî gundan kirin û bi sedan mirovên me qetil kirin. Potansiyela wan a wisa heye. Ji ber vê yekê divê bên darizandin û cezakirin. Hêzên ku dibêjin em li dijî DAIŞ'ê ne, divê erkên xwe pêk bînin. Divê DAIŞ jî weke ferasetekê were darizandin. Ji ber vê yekê dewleta Tirk ji van dadgehan ditirse, lewma naxwaze çete bên darizandin. Lê divê hesab ji DAIŞ'ê bê pirsîn û kê alîkariya wan kiriye yan jî bi wan re hevkarî kiriye divê li gorî hiqûqa navneteweyî hesab were pirsîn.

# Encamnameya Komxebata Lozanê

**Komxebata navneteweyî ya "Lozan: Rastkirin û çareserkirina pirsgirêkên aramî û ewlehiya herêmî" bi encamnameyekê bi dawî bû.**

Komxebata ''Lozan: Rastkirin û çareserkirina pirsgirêkên aramî û ewlehiya herêmî'' ku ji aliyê Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS) ve hat lidarxistin bi encamnameyekê bi dawî bû.

**Encamname wiha ye:**

"Navenda Rojava ya Lêkolînên Stratejîk (NRLS), di 6 – 7'ê Tîrmehê de komxebateke navneteweyî bi navê 'Lozan: Rastkirin û çareserkirina pirsgirêkên aramî û ewlehîya herêmî' li dar xist. Di komxebatê de sedsaliya Peymana Lozanê hat destgirtin. 200 kes ji partiyên siyasî, akademîsyen, tevgerên jinan, saziyên civakî û rewşenbîrên ji her çar perçeyên Kurdistanê, Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê, Rûsya, welatan Ereban û kesayetên navneteweyî beşdarî komxebatê bûn. Beşdaran teqez kirin ku Peymana Lozanê ya ku bi peymana aşitiyê tê binavkirin, aşitî û aramî ji gelê Kurd û gelên herêmê



re neanî, lê rewatî da qirkirina gelan û çandan ku bi sazkirina dewletên neteweperest şer ragihandin.
Vê peymanê rê vekir ku di navbera dewletên herêmê de gelek peymanên ewlekariyê çêbibin û bi rêya pêngavên pişaftina neteweyî, guhertina demografî, terora siyasî û guhertinên rastiyên dîrokî, hebûna gelê Kurd û hebûna gelên herêmê armanc girtin. Jixwe aloziyên siyasî, aborî û ewlehiyê yên ku di herêmê de rû didin encama van siyasetanên ku pala xwe dabûn vê peymanê, ew jî ji bo pêkanîna armancên girêdayî çespandin û berdewamîya desthilatiya stemkar, yekgirtiya dewlemendiyan û qirkirina nijadên resen ên li herêmê. Li gor wê, beşdarên komxebatê gihane komeke pêşniyar û daxwazan ku dikarin doza Kurdî û pirsgirêkên ewlehî û aramîyê çareser bike. Pêşniyarên hatine kirin ev in:
1-Em teqez dikin ku piştî sed sal di ser morkirinê wê re derbas bû, Peymana Lozanê nikarîbû aştî û aramiya herêmî peyda bike. Divê dewletên berpirsên vê peymanê pirsgirêkên ku ji ber vê peymanê derketine rast û çare bikin. Divê piştgiriya dewletên ku vê peymanê li gor berjewendiyên xwe bikar tînin û hêza stemkariya xwe li ser gelê Kurd ferz dikin, rawestînin.
2- Li gorî peymanên mafên mirovan û peymana Neteweyên Yekbûyî, divê dewletên bibandor ên di siyaeta navnetweyî de doza Kurdî bipejirînin û mafên gelê Kurd ê xwebirêvebirina siyasî, çandî, aborî, civakî û ewlehî mîsoger bikin. Divê ev maf di çarçoveya peymaneke nîştimanî de were mîsogerkirin û ev peyman bi dewletên ku xaka Kurdistanê parçe kirine re were pêkanîn.
3- Ji bo parastina gelê Kurd ji qirkirinê, divê hêzên kurdistanî derftên xwe yên siyasî, aborî leşkerî xurt û hevrêz bikin. Li ser vî bingehê divê hêzên kurdistanî bêyî cûdabûna nêrînan, peymaneke neteweyî îmze bikin. Divê tevahî alî li gorî vê peymanê tev bigirin.
4- Gelê Kurd li vê herêmê gelekî resen e, tu metirsiya wî li ser gelên cîran tune ye, ji ber vê yekê divê dewletên ku xaka Kurdistanê parçe kirine, siyasetên xwe yên li dijî Kurdan careke din berçav derbas bikin û mafên Kurdan di jiyan û xwebirêvebirina hemû kar û barên xwe di çarçoveya erdnîgarîya welatên ku Kurd lê ne, bipejirînin.
5-Neteweya demokratîk weke raman û felsefe, xwe weke çareseriyeke gengaz ji pirsgirêkên aştiya herêmî, parastina çandên kevnar li herêmê ji tundrewîtiyê û rizgarkirina rizgarkirina xelkê ji qeydan nîşan dide. Ev proje di ezmûn li herêmê Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê yên di bin sîwana Rêveberiya Xweser de tê jiyîn.
6- Divê parastin, piştgirî û pejrandina navneteweyî ji Rêveberîya Xweser a ku rewatiya xwe ya zagonî û sincî ji saziyê xwe yên xizmetguzarî, siyasî û leşkerî digre, were peydakirin.
7-Berdewamkirina êrişên li ser gelê Kurd ê li her çar parçeyên Kurdistanê, berdewama Peymana Lozanê ya ku kuştin û koçberkirina gelê Kurd bi destên dewletên neteweperest rewa kirine.
8- Beşdaran diyar kirin ku dijminên gelan pabendî bi tu rêzik û peymanên navneteweyî nabin. Ji ber vê yekê beşdarên komxebatê ji hêzên navneteweyî dixwazin ku mekanîzmeyekê hilbijêrin û li gorî wê dijmin neçar bikin da ku pabendî zagon û peymanan bibin.
9- Em teqez dikin rêya yekane ya derbaskirina encamên Peymana Lozanê û rêgirtina li ber peymanên nû yên stemkar ên li ser herêmê, xwespartina li hêza gel e. Ji ber vê yekê beşdarên komxebatê bang li civata navneteweyî bi hemû desteyên wê yên têkildarî dikin ku li hemberî siyasetên paşguhkirin, înkarkirin û qirkirinê ku li ser gelan têne meşandin, berpirsyariyên xwe bi cih bînin. Her wiha bang li komîteyên hiqûqî û aliyên têkildar ên li Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê dikin ku pêşniyarên komxebatê li cem aliyên navneteweyî yên têkildar bişopînin."

# 'Hêzên navneteweyî hevkarên sûcê tecrîdê ne'

Endamê Saziya Malbatê Şehîdan a bajarê Qamişlo Ebdulqadir Îbrahîm diyar kir ku tecrîda li ser Rêber Abdullah Ocalan sûcekî dijmirovî ye, tevahiya nirxên mirovahiyê binpê dike û got, hêzên navneteweyî bi bêdengiya xwe hevkarên sûcê tecrîdê ne.

**Ronaz Silêman /Qamişlo**



Di 15`ê Sibata 1999`an de, di encama Komployeke Navneteweyî de, Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan hat revandin û radestî dewleta Tirk a dagirker hat kirin,ji destpêka dîlgirtina Rêber Apo û heta niha,tecrîdeke giran li ser tê ferzkirin, ev zêdeyî 2 sal û nîvan e ku tu agahî ji Rêber Apo nehatiye girtin, faşîzma Tirk bi henceta cezayê displînê hevdîtina Rêber Apo bi malbat û parêzerên wî re qedexe dike. Tevî ku li gorî pîvan û zagonên navneteweyî tecrîdkirina mirovan sûcekî dijmiroviye jî, lê li hemberî tecrîda girankirî ya li ser Rêber Apo tevahiya rêxistin û saziyên navneteweyî ji bo berjewendiyên xwe çavê xwe digirin.

Derbarê tecrîda girankirî ya li ser Rêber Abdullah Ocalan û bêdengiya cîhanê li hemberî tecrîdê, endamê Saziya Malbatê Şehîdan a bajarê Qamişlo Ebdulqadir Îbrahîm ji rojnameya me re axivî.

**'Cîhan li hemberî tecrîda Rêber Apo bêdeng e'**

Ebdulqadir Îbrahîm anî ziman ku tecrîda li ser Abdullah Ocalan roj bi roj girantir dibe û wiha domand:"Hêzên komploger ji bo ku îrdeya gelê kurd têk binin, tecrîda li ser Rêber Apo girantir dikiin, li hemberî wê jî asta berxwedana Rêber Apo û ya gelê Kurd jî bilintir dibe. Tevî ku tecrîd sûcekî dijmiroviye jî, rêxistinên mafên mirovan yên cîhanê ji bo berjewndiyên xwe bêdeng dimînin, herwiha bi bêdengiya xwe dibin hevkarên dewleta Tirk a dagirker. Ev demeke dirêje ku derbarê rewşa Rêber Apo de tu agahî nehatine girtin, dagirkeriya Tirk bi tecrîdê tevahiya zagon û pîvanên navneteweyî bin pê dike."

**'Felsefeya Rêber Apo çiraya Azadiyê ye'**

Îbrahîm diyar kir ku felsefeya Rêber Apo ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn çiraya azadiyê ye û wiha got:"Rêber Apo ji azadiya gelên herêmê têkoşîneke bêhempa da meşandin û hîn jî têkoşîna wî berdewam dike, Rêbertî bi berxwedana xwe ya dîrokî planên komplogeran pûç kir, herwiha ji bo tevahiya gelên Rojhilata Navîn bû meşeleya azadiyê. Ji ber wê jî tevahiya gelên azadîxwaz yên cîhanê tê xwestin ku li hemberî tecrîdê bêdeng nemînin û bi erkê xwe yê exlaqî rabin, gelên herêmê deyndarên Rêber Apo ne, ji ber ku



bi saya fikrê Rêbertî zincîra tirs û koletiyê ya ku bi destê desthilatdaran hatibû çêkirin, hat şikandin."

**'Tu kes nikare pêşî li fikrê Rêbertî bigre'**

Endamê Saziya Malbatê Şehîdan a bajarê Qamişlo Ebdulqadir Îbrahîm da xuyakirin ku ew ê li hemberî tecrîdê asta têkoşîn û berxwedanê bilintir bikin, herwiha Rêber Apo fîzîkî azad bikiin û axaftina xwe wiha qedand: "Em wekî gelê kurd û bi taybet Saziya Malbatên Şehîdan ji me tê xwestin ku têkoşîna xwe mezintir bikin. Divê gelê kurd ji bo azadiya fîzîkî ya Rêber Apo bi şev û roj kar û xebatê bikin û li derdora fikrê Rêbertî bibin xelek. Wê tu kes nikaribe vîna gelê Kurd bişkîne û pêşî li fikrê azad yê Rêbere Apo bigre."

# Vagnera Mala Barzanî Pêşmergeyên Roj

**Volqan Elî**

Împaratoriya Pûtîn ku li ser mîrasê bi dehan milyon şehîdên şoreşa mezin a Oktobirê ava bûye bi îsyana Wagnerê teşhîr bû. Derket holê ku artêşa Rûs ya Ukrayna dagir kiriye, xwe dispêre Wagnerê. Wagner artêşek ji diz, qetil û mafyayan çêbûye. Rêxistineke para milîter e. Yanî ji aliyê dewletan ve, bi armanca ku karê xwe yê qirêj (karekî paqij ê dewletan tineye lê gotin wisa tê) pê biqedînin tên avakirin. Cudahiya van ji artêşên fermî ew e; dewlet û hêzên dagirker van ji derveyê fermiyetê ava dikin. Ji bo xwe bi kar tînin. Lê di fermiyeta navnetewî û navdewletî de hebûna van (xwediyên wan bi xwe) qebûl nakin. Piştî vê îsyanê ew jî derket holê, mafya û qetilê mezin împaratoriya Rûsî ye. Ruxmî ku ev bûyer tam zelal nebûye çi tişt e, ya niha ji me xuya dike ev e. Du rêxistinên diz û mafya xwe li hev rakişandine. Lê di dawî de, herî kêm niha, li hev kirine. Tiştekî din jî ji vî karî bê yom aşkere bûye; rêxistinên paramilîter, diz û mafyavarî lê dibe ku xwediyê xwe bifitilin.

Bi rastî nirxandina vê ne mijara nivîsa me ye; ji ber ku analîz û tehlîlên dûr û dirêj hewce dike. Wisa bi şiklekî kurtebir nayê vegotin. Me tenê xwest em balê bikişînin li ser encamên wê. Yanî ev amûr û amûrên wisa bi qirêj ên Şerê



Cîhanî yê Sêyemîn ji bo xwediyê xwe jî dibe ku ne bi feyde bin.

Gotina me çi ye; ji beriya demekê û niha jî hê di rojevê de ye Pêşmergeyên Roj ku ji aliyê ENKS'ê û mala Barzanî ve tê rojevkirin.

SADAT rêxistineke di ayarê Wagnera Rusî ye ku bi talîmata Erdoğan hatiye avakirin e. Yanî dewleta Tirk karê xwe yê qirêj bi vê maşikê dike. Serokê wê jî ji Pogijnî ne baştir be dostê qedîm ê Erdoğan e û bazirganekî ola Misilmaniyê ye. Ev rêxistin texrîbatên ku di 2017'yan de li Duhoka Başûrê Kurdistanê baregeha xwe ava dike. Ev, ne tenê bi gotina me wisa ye. Eger were bîra xwendevanan an jî ji beriya hilbijartinê, yên ku tv'yên Tirkan ji bo demeke kurt temaşe kirî hebin, Kılıçdaroğlu jî hewl dabû bi teşhîra vê SADATê, ji Tayip îqtidarê bistîne. Lê heta vê rêxistinê ew jî bi kuştinê tehdît kiribû (ji axaftinên Kemal Kılıçdaroğlu wisa dihate fêmkirin). Vaye ev rêxistina dişibe Wagnera Rusî, piştî ku li Başûr baregehên xwe çêdike dest pê dike, li Baregaha artêşa Tirk ya li Musul/Başîqayê Pêşmergeyên Roj perwerde bike. Jixwe belgeyeke pir neyînî (veşartî) piştî 2010'an li balyozxaneya dewleta Tirk li Hewlerê, Xebateke wisa hê di wê demê de kiribû mijara xwe. Li gorî çavkaniyên li cem me, belgeyek ku di vê dîrokê de gihaştiye cihê navborî dibêje ku divê dewleta me (dewleta Tirk) ji Kurdên bakurê Sûriyeyê ( Rojava) hêzeke leşkerî ava bike. Piştre divê ev, biçe li Sûriyeyê şer bike. Ji bo ku em karibin tesîra Apoçiyan li wê derê kêm bikin, mejiyê civakê tevlîhev bikin, hewce dike ev hêz girêdayî bi Kurdên bakurê Iraqê (armanc ji 'Kurdên Îraqê' PDK û mala Barzanî ye) be.

Vaye SADAT'ê (Wagnera Tayip) li ser vî mîrasî li Başîqa-Musulê dest bi perwerdekirina Pêşmergeyên Roj dike. Bêguman em naxwazin bêjin, Pêşmergeyên Roj bi her tiştê xwe ve ji aliyê Tirkiyeyê ve hatiye avakirin. Na! Çîrokeke vê jî heye. Ew jî bi serê xwe tiştekî pêkenok û ecêb e. Lê ji ber ku herî kêm li gel me belgeyên wê tine, em dibêjin çîroka wê. Li gorî hin gotinên muhtemelen rast dibêjin ku di destpêkê de navê Pêşmergeyên Roj, Pêşmergeyên Rojava bûye. Lê piştî ku Tirk dest tê werdidin, kelîmeya 'Rojava' nikarin



daqurtînin, dibêjin ku "divê navê wê hêzê em bikin Pêşmergeyên Roj". Em tenê ji xwendevanên xwe re dibêjin, herî kêm di destên me bi xwe de ti belge nebin jî, bi îhtimaleke mezin ev gotin hemû jî rast in.

Hûn ê bêjin çima?

Tê bîra xwendevanên me yên heja, ne wisa ye? Di sala 2022'yan de li Xelîfanê û derdora wê çend grûbên gerîlayên azadiyê ketin kemînên bê bext. Hin gerîla şehîd ketin, hin jî çarenûsa wan hê jî diyar e. Li gorî çavkaniyan, hêza kemîn daniye li ber gerîla, Pêşmergeyên Roj in. Çîroka Wagnerê wisa gihaşt xaleke diyar, pêşeroja SADAT'ê ti kes nizane û ya Pêşmergeyên Roj jî niha ve şibiyaye 'roviyê fêlbaz'. Lê em tiştekî dizanin; Dema Tayîp tengav dibe xwe diavêje ber bextê Pûtîn. Wexta ku damara xiyanetê ya mala Barzanî lê dide xwe diavêje ber bextê Tayip. Dewlet li serê Pêşmergeyên Roj û SADAT'a Tayip, gelo dawiya wan nebe wekî Wagnera Putin?



# Rûpelek ji dîrokê...(1)

**Kakşar Oremar**

Dîroka Kurdan a şoreş û azadîxwaziyê bi qasî rengîniya diyalektîk û erdingariya wan dewlemende, lê kelemên xiyanetê jî tim û tim li kêleka gulên evîndarên dozê şîn bûne. Bi îmzakirina peymana Lozanê re ku hevçax bû bi hilweşîna Imperatoriya Osmanî re dîsa rûçikê xiyanetê yê gemar hate dîtin. Ew cara çendê bû ez nizanim lê vê carê aşê wê xiyanet xwîneke mezin bi xwe re da herikandin. Bi her serhildanekî re dehan hezar kes hatin şehîdkirin û ji axa Kurdistanê dûrxistin. Pêre jî Kurdistan wêran kirin. Ev rewş tenê li pareke axa me nebû, belkî li her çar aliyan weke hev bû.

Di sala 1923'an de nûnerên dewleta Tirk a ku hê li ser mîrasê Osmaniyan ava nebibû di Peymana Lozanê de amade bûn. Lê dema ku hewl dan bi wan re peymanekê îmza bikin, bi dijberiya nûnerên Ewropayê re rû bi rû man. Nûnerên Ewropî îmzakirina peymanê red kirin û bi zelalî ji wan re wiha gotin:" Li rojhilatê Tirkiyê gelê Kurd û xaka Kurdan heye ku di serdema Osmaniyan da weke "KURDISTAN" hatiye naskirin, eger em peymanê îmze bikin gelo yê çi were serê Kurdan an jî qedera wan a siyasî-civakî yê di çarçova sinorên dewleta we de bi çi awayî bê diyar kirin û îdarekirin"?

Şandeya Tirk a di bin serokatiya Ismet Inönü(1884-1973) û çavdêriya Mistefa Kemal(1881-1938) a ji rêya dûr de got ku:" Tirkiye ne tenê dewleta Tirkan e. Dewlet ya her du gelan (Kurd û Tirk) be û êdî biryara jiyana bi hev re dane...", lê nûnerên welatên Ewropayî ji gotin û sozên heyeta Tirk bawer nekirin dema ku yek car jî navê Kurd bi ser zarê wan de nedihate gotin û bihîstin.

Serokê şanda Tirkiyê ya rêkeftinê Îsmet Paşa an jî Inönü ku ji Kurdên Meletî bû bi hawara Mistefa Kemal ve hat û jêre wiha got:" Eger hûn nebin alîkar, dewleta Kurdî ava dibe, xalên Severê tên cî bi cîkirin,divê hûn ji Ewropiyan re îsbat bikin ku Kurd û Tirk bi hev re dijîn, ji bo hilweşandina Peymana Sevrê gere hûn hemû hewldanên xwe bidin".

Mistefa Kemal bi xapandikariyên



Kakşar Oremar

xwe yên ji berê de gazî Kurdekî Xozata Dêrsimê yê bi navê Hesen Xeyrî(1881-1925) kir û jê xwest ku cil û bergên Kurdî li xwe bike û roja din bi wî re here parlamentoyê û ji rojnamevan û şandeyên welatên din re nîşan bide ku hikûmeta Tirkiyê hemû mafên wekhev ji Kurdan re jî pêşkêş dike û hebûna Kurdan, cil û bergên wan ên netewî, ziman û çanda wan qebûl dike".

Hevjîna Hesen Xeyrî dema li malê pêre xeber dide û hay ji gotinên wî yên derheqa mijarê de dibe jê re lava dike ku:" karekî wiha neke, mekeve davka "Mistoyê Kor û Îsmetê heramzade" û xiyanetê li gelê Kurd neke, tu yê poşman bibî lê êdî pişt re poşmaniya te yê bêsûd be...", lê Hesen Xeyrî guh nade xanima xwe û bi girnijîneke sivik jêre dibêje:" Ew ne karê te ye, tu ji siyastê çi fam dikî ku şîreta li min dikî?!" Xanim jê re dibêje:" Ez ji siyasetê jî fam nekim lê ez Tirka baş dinasim û ewê te bixapînin û pêre jî yê bextreşî bibe para hemû Kurdên Kurdistanê...". Hesen Xeyrî dîsa jî qîmetê nade daxwaz û gotinên hevjîna xwe ya salên dirêj û ji roja paşê re amadekariyên xwe dike. Hemû amadekarî û xebatên wî jî ev bûn:

Çend caran Hesen Xeyrî bi cil û bergên Kurdî çû meclîsa Tirkan, encûmena wan ziyaret kir û bi dengekî bilind got ku:" Kurd naxwazin ji Tirka veqetin û yê bi birayên xwe yên mislman re bimînin....".

Piştre M. Kemal jê xwest ku telgrafeke wiha û xwedî wê naverokê bişîne Lozanê ku nûnerên Ewropî bibînin û gotinên Ismet Inönü bawer bikin.

Wî bi şandina wê telgrafê ji nûnerên Peymana Lozanê re hemû delîlên ku rastiya wan nayê înkarkirin da xûyakirin ku nûnerê gelê Kurd li meclisa Tirkane. Mistefa Kemal, Ismet Inönü û dehan kesên din jî gotinên wî "erê kirin" û dane selmandin ku H. Xeyrî nûnerê Kurdan li Tirkiya nûavabûyî ye. Ew karê han bû sedem ku wan jî peyman îmza kirin û pêre jî êdî dewleta Kurdî ava nebû. Ji wê rojê û shûnde peymana Sêvrê hate dawiyê ku di 10ê Cotmeha sala 1920an de hatibû îmzakirin û hin maf û biryarên girîng ji bo paşeroja Kurd û Kurdistanê têde hatibûn diyarkirin. Ev destpêka bûyerên tiran jî ji Hesen Xeyrî, sedan siyasetmedar û gelê Kurd re bû.



Piştî ku kerê Tirka ji pirê derbas bû bi destûra Mistefa Kemal nûnerê Kurdan anku Hesen Xeyrî hat girtin û ew şandin Dadgeha Îstiqlalê. Ew li dijî wê biryarê deket û ji Dêrsimê Seyîd Rizayê Dêrsimî(1863-1937) piştgîrî dan wî. Ew vegerî gundê xwe, lê Mistefa Kemal li derfetekê digeriya ku dawiyê bi jiyana wî bîne. Dadgeha ku ji Kurdan li Kurdistan û Tirkiyê biryar û demên mehkemekirinê pir ji hev cuda bûn bi awayekî nihînî destûr ji Mistefa Kemal standibû ku şopa Hesen Xeyrî wenda nekin. Piranî kesên Kurd perwer û şoreşger di dadgehên formalîte û çend deqeyî de dihatin darizandin û biryara îdamê bi ser wan de dihate standin. Lê li Tirkiyê û bajarên weke Enqerê ew dadgeh bi rojan didomin û kes jî îdam nedikirin. Serhildana Şêx Seîdê Pîran li sala 1925an bû sedem ku Mistoyê Kor tola xwe ji Hesen Xeyrî bistîne. Sala 1925an di dadgehên Îstiqlal de sedan Kurd tevî rêberê şoreşê Şêx Seîdê Pîran bi awayekî dûr ji pirensîbên yasayî û edaletê hatin mehkemekirin û




Hesen Xeyrî

îdamkirin. Bi destûra serleşkerên artêşa Tirkiyê ew Kurdên dijberî wan li derên nediyar hatin veşartin û heya roja îro jî kes nizane mezarê Şêx Seîd û hevalbendên wî li kûne!!.

**Dadgeha Hesen Xeyrî!**

Di havîna sala 1925an de serhildana Şêx Seîd rastî şikestê hat. Di dadgeha Istiqlal a ku raste rast bi destûra Mistefa Kemal dihate şopandin û birêvebirin de, Xeyrî bi tawanên weke:" cudaxwazî, hevkariya bi eşqiya û lixwekirina cil û bergên Kurdî li parlamentoyê hat tohmetbarkirin û du-sê deqeyan jî mafê axaftinê dane wî. Wî bi dengekî tije êş, rûyekî tije xemgînî û hestên poşmaniyê wiha got: " Min ji bo nehiştina serxwebûna Kurd û Kurdistanê wisa kir û telgrafek ji Lozanê re şand û rêkeftina Sêvrê betal kir. Rêkeftina ku di çend bendên wê de serxwebûn û hemû mafên çêkirina dewleteke serbixwe didane Kurdan...."

Serokê dadgehê bi tundî li wî nêrî û bersiva Hesen Xeyrî wiha da: "Em dizanin ku we rê li ber




serxwebûna Kurdistanê girt, lê lixwekirina cil û bergên Kurdî li parlamentoya Tirkiyê binpêkirina yasayên me û destûrê ye. Êdî mafê te yê xweparastinê jî tune û li benda biryara dawiyê be." Hevalekî nêzî Xeyrî jî re got ku weke gelek kesên din dawa lêborînê ji Mistefa Kemal bike, lê wî ew daxwaz nepejirand û jêre wiha got:" Min karekî wisa nekiriye ku dawa lêborînê bikin, divê M.Kemal dawa lêborînê li min bike ku hemû peymanên dostanî û hevalbendiyê ji bîr kirine. Mirineke bi serbilindî ji vê jiyanê xweştire..."

Piştre bi awayekî pir bêşermane biryara dadgehê wiha hate xwendin:" Dadgeha Istiqlal a komara Tirkiyê ji ber tawanên cudaxwazî, hevkariya bi serhildêrên Kurd û liberkirina cil-bergên Kurdî cezayê darvekirinê ji xayînê welat Hesen Xeyrî re daye".

Di dawiyê de, wan jê pirsî ku:" Hesen Xeyrî daxwaza te ya dawî çiye?". Hesen Xeyrî bi dengekî bilind bang kir: "Min li cihekî li ser rêya Kurdan binax bikin ku her Kurdek dema ber min re derbas dibe gora min bibîne û tif-leineta li min bike an jî tifbarana tirba min bike". Wî heta guhê xwe neda hevjîna xwe ya wefadar û bi vî awayî bû qûrbana sadatî û xweş xeyaliyên xwe û rayedarên dewleta Tirkiyê a înkarker û cinayetkar.

FENER



## Havîneke germ li benda me ye

**Idrîs Henan**

Piştî gera dawî ya civîna Astana /20/ tevgerîna leşkerî li bakur rojavayê Sûriyê, taybet li Idlib û gundewarên rojavayê Helebê zêde bû.

Kesên ku encamên Astana /20/ û pratîka wê ya lihevketî dişopîne; baş têdigihêje ku civîna çaralî tiştekî nû bi xwe re neanî. Tenê rejîma Sûriyê weke jimar li aktorên wê zêde bû û hemûyan bi hev re îmzeya xwe li bin deklerasyona tunekirina tekane projeya demokratîk, xistin.

Çi danesîn û xalên weke encam hatbin derketin jî, li gorî dil û daxwazên faşîzma Tirk bûn ku hemû li dora xala tewanbarkirina Rêveberiya Xweser a Bakur û Rojhilatê Sûriyê digeriyan. Astana bi xwe mînaka dirûtiya siyaseta navneteweyî ya li dijî vîna gelan e. Di heman demê de; hevrikiya hegemoniyê ya sedsaliya Lozanê ye ku her aliyek altirnatîfa wê bi navekî cuda, cilûbergên cude û sernavekî nû, amade dike.

Çendîn Rêveberiya Xweser helwesta xwe ya yekparebûna axa Sûriyê diyar kiribe û insiyatîfa çareseriyê pêşkêş kiribe jî; lê dîsa jî paşguh dikin qey mirov dibêje ev rêveberî bi dîwarekî re diaxive?!

Dema komplogerên Astana di encamnameya xwe de qala Alnusra, Alqayîde û Îxwan Elmislimîn û çêlçûkên li ser maseya faşîzma Tirk tîmar dibin nakin, dêmekî projeya parçeker a dagirkeriya Tirkiyê erê dikin û kiryarên Tirkiyê û çeteyên wê rewa dikin. Yanê; çi sûcê ku faşîzm li herêmên dagirkirî dike, cemeta Astana şirîkê wê ye. Ji wê zêdetir, dagirkeriyê motîve dikin ku çi plan û xeyalên wê hebin eşkere eşkere bi raya giştî re parve bike. Bê guman; nexşeya vê dawiyê li Stenbûlê di bin navê Tirkmenan de derketiye, wê nêrîna li jor piştrast dike.

Îro heman girûpa komplogeran, bi rêbaza berfirehkirina hevkariya istixbaratî û ewlehî, giranî dane pêşxistina têkîliya herdu rejîmên Sûriyê û Tirkiyê. Heman wextê, hewl didin bi hevakarî; aliyê leşkerî ve dorê li herêmên Rêveberiya Xweser bişidînin, ambargo zêde bikin û provakasyonê bikin. Dixwazin valahiyên ewlekariyê tije bikin û bê istikrarê li herêmê bidin avakirin ku gel bidin revandin û bê îrade bihêlin.

Eger mirov daxuyaniyên herdu rejîmên Tirkiyê û Sûriyê guhdar bike, dibîne ka çendîn rêya lihevkirina herduyan zor û zehmet e. Lew re jî; encamên bi navê lihevkirinê tên der, glover û dubarekirî ne. Di dawiyê de dagirkeriya Tirk herêmên xesib kirine li gorî projeyên xwe ji nû ve dîzayîn dike û guherînên demografîk pêk tîne û kemberên ewlehiyê li bakurê Sûriyê ava dike. Bi gotinek din; dibe ku li ser xalên dijatiyê li hev kiribin, lê geşedanên li ser erdê isbat dikin ku; nekarîne mekenîzmeya pratîzekirina wan xalan destnîşan bikin. Ew jî xwe dispêre cudahiya berjewendî û ecîndeyên zihnî yên her aliyekî.

Lê tişta misoger, havînek germ li benda bakur û rojhilatê Sûriyê ye. Ji ber dûrbûna ji xeta çareseriya demokratîk û îradeya navneteweyî, wê tişek bi navê "Herêmên kêm Şer" jî nemîne û gengaze hinek destguhertinên leşkerî li ser erdê çê bibin, taybet jî li derdora herdu xetên M4 û M5.

Tişta pêwîste ku rejîma Sûriyê fêm bike ew e; avakirina têkîliyên bi faşîzma Tirk re, yekparebûna axa Sûriyê dixe xeteriyeke cidî û dê pêşeroja desthilatdariya wê tarî bike û wê bandorê li tevayî herêmê jî bike.